

## Beriya destpêkirina hevpeyvînê divê hûn ji kîjan heqî werin agahdarkirin?

### 1. Maf û heqê rawêjkariyeka veşartî bi parêzerê an arîkariyeka hiqûqî ra li dema hevpeyvînê

#### A. Parêzer

- Hûn dikarin daxwaz bikin bi parêzerê bi dilê xwe ra pêwendiya we hebe.
- Eger parêzerê we bixwe tunebe yan ew parêzer nikaribe were, hûn dikarin ji navenda parêzerên erkdar ên Encumena Parêzeran daxwaza bo pêwendiyê bikin.
- Eger hûn li gorî hin şertên qanûnî bin, ev arîkariya hiqûqî yan bi giştî yan jî hinekî belaş û bê pere ye. Hûn dikarin daxwaza forma diyarkirina şertên arîkariya hiqûqî bikin.

#### B. Rawêjkariya veşartî ya berê

- Beriya hevpeyvîna din – û di nava 2 saetan piştî axaftina we bi parêzerê ji navenda parêzerên erkdar ên Encumena Parêzeran – mafê we ye bi qasî sî deqîqeyan bi parêzerê xwe ra bipeyivin û renga li demên awarte da li ser bîyara hevpeyvînkariyê dirêj jî bibe.
- Ev rawêjkarî dikare bi telefonê yan li ciyê hevpeyvînê pêk were.
- Eger rawêjkariyên bi parêzerê we ra heya 2 saetan pêk neyê, wek berê rawêjkariya veşartî bi telefonê bi navenda parêzerên erkdar ên Encumena Parêzeran ra dê pêk were. Piştî vêya, hevpeyvîn dikare dest pê bike.
- Eger parêzerê we li nava hevpeyvînê da bigihîje, ew dikare li bermaya hevpeyvînê beşdar be.

#### C. Arîkariya hiqûqî li nava hevpeyvînê

- Mafê we ye parêzerê we li hevpeyvînê arîkariya we bike
- Parêzerê we dê misoger bike:
  - o ku mafê we yê bêdeng mayîne û mudaxile nekirinê parastî ye;
  - o awayê tevgerîna bi we ra li hevpeyvînê, çî bikevin bin zexta nedurist an na;
  - o ev rastiya ku mafên we ji we ra hatine şirovekirin û rêkûpêkbûna hevpeyvînê.

Eger parêzerê we li bara her yek ji van mijaran nêrînen wî/wê hebin, ew dikare wan li axaftina hevpeyvîna polis bide tomarkirin.

Renga parêzerê we daxwaza zelabûnê li bara pirsên tînin kirin bike. Ew izna wî tuneye li şûna we bersivan bide yan pêşiya hevpeyvînê bigire.

- Hûn yan parêzerê we mafê we heye carekê û bo rawêjkariyeka zêde ya awarte hevpeyvînê bidin taloqekirin. Eger li nava hevpeyvînê hêman yan sûcên teze diyar bibin, hûn dikarin bi parêzerê xwe ra careka din rawêjkariyê bikin. Ev rawêjkarî divê ji 15 deqeyan dirêjtir nebe.

#### D. Devjêberdan

Hûn neçar nînin bo rawêjkariyê yan arîkariya ji parêzerê daxwazê bikin.

Hûn dikarin piştî venêrîna pêwîst, bi dilê xwe dev ji vî heqî berdin,:

- eger hûn li emrê û temenê qanûnî ne;
- piştî ku we îmze kir û belgeyek bo wê nîşan da.
- eger mimkin be, meriv dikare ji hevpeyvînê filmê bigire. Hûn dikarin bi parêzerê xwe ra ser vêya biaxivin (Herwiha li xala 7 binêrin).

Hûn dikarin bo van mijaran bi telefonê bi kesekî li navenda parêzerên erkdar ên Bar Association (Encumena Barê) re biaxivin.

#### E. Betalkirin

Di rewşên awarte da û li rewşa mejbûrî da, Dozgerê venêrîne dikare bîyar bide ku mafê rawêjkariya veşartî yan arîkariya ji parêzerê li dema hevpeyvînê nede we. Ew divê bo vê bîyarê sebaan bibêje.

#### F. Heqê hebûna parêzerê li welatê ku hikmê girtina ewrûpî daye

Heqê we ye li welatê ku hikmê girtina ewrûpî daye, parêzerê diyar bikin. Ev parêzerê dê agahî û tewsiyeyên li bara rêbaza vegeandinê bide parêzerê we yê li Beljîkayê.

## 2. Agahiyên li bara hikmê girtina ewrûpî yan APB

- Heqê we ye ji naveroka hikmê girtina ewrûpî yan APB agahdar bin.
- Eger bi armanca pêkanîna cezayekî daxwaza vegerandina we bûye û hûn ji vê mehkûmbûnê yan karên cezayê tê agahdar nebûne, hûn dikarin daxwaza kopiyek ji hikmê biyanî bikin ku bo agahdarbûna we ye û ev dikare li wextê da pêk were.

## 3. Heqê bêdeng mayîne

- Tu caran nikarin we mejbûr bikin xwe sêcdar bikin.
- Piştî ku we xwe da nasîn, renga hûn bixwazin daxuyaniyekê bidin, bersiva pirsan bidin yan jî bêdeng bimînin.

## 4. Evê ku kesek bizanibe hûn hatine girtin

Heqê we ye kesekî din ji girtina xwe haydar bikin.

Lê ev dikare ji ber rewşa dijwar ji aliyê Dozgerê Giştî yan Serdozgerê va bo dema pêwîst a li berjewendiya lêpîrsinê were paşxistin.

## 5. Arîkariya bijîşkî

- Heqê we ye eger pêwîst be bi belaş arîkariya bijîşkî wergirin.
- Renge hûn hez bikin dixtorê bi dilê we be. Eger wiha be, ev ê bi xercê we be.

## Li hevpeyvînê heqên we yên din çî ne?

### 6. Heqên din li dema hevpeyvînê

Hevpeyvîn bixwe bi hin danûstandinan dest pê dike. Ji bilî dubarekirina danûstandina kurt a suncan, heqê we ye bêdeng bimînin, hûn ê agahdar bin ku:

- Renge hûn daxwaza bikin hemû pirs û hemû bersiv bi peyvên we bixwe werin tomarkirin;
- Renge hûn daxwaz bikin lêkolîneka taybet were kirin yan kesekî taybet were hevpeyvînkirin;
- Gotinên we yên hemberî dadgehê wekî belge bi kar tên.
- Li dema hevpeyvînê, hûn dikarin belgeyên xwe bi kar bînin lê ev divê nebe sebeba dirêjbûna hevpeyvînê. Hûn dikarin piştî yan dema hevpeyvînê daxwaz bikin ew belge li gotara hevpeyvînê ya polîs zêde bibe yan bidin beşa Tomarê ya Dadgehê.

### 7. Fîlmgirtina hevpeyvînê

- Eger mimkin be, bo çavdêriya ser hevpeyvînê, filma wê dikare were girtin.
- Hevpeyvînkarekî, Dozgerê venêrînê biryara vêya dide.

### 8. Li dawiya hevpeyvînê

Li dawiya hevpeyvînê, ew ê nivîsa hevpeyvînê bidin we ku bixwînin. Renge hûn daxwaz bikin kesek bo we bixwîne.

Ew ê ji we bipirsin gelo tiştek bo guherînê yan zêdekirinê heye yan na.

### 9. Arîkariya wergêr

- Eger hûn zimên fêm nakin yan naaxivin, yan eger astengiyên we yê axaftin yan bihîstinê hene, heqê we ye li dema rawêjkariya veşartî bi parêzerê xwe ra daxwaza wergêr bikin. Ev arîkarî belaş e.
- Eger hûn bixwazin bi zimanekî cuda ji zimanê hevpeyvînê biaxivin, ew ê gazî wergêrekî sondxwarî bikin ku dema hevpeyvînê arîkariya we bike. Ev arîkarî belaş e.
- Renge ji we bixwazin gotinên xwe bi zimanê xwe binivîsin.

### 10. Qebûlkirina vegerandinê

Renge hûn qebûl bikin bo wî welatî werin vegerandin ku hûn dixwazin. Renge hûn qebûlkirina xwe bikin çarçoveya cezayên diyarbûyî li hikmê girtina ewrûpî. Renge hûn dev ji qanûna taybetmendiyê berdin ku yanê piştî hûn hatin vegerandin, hûn ê wekî beşek ji pêkanîna hikmê sepanî bo cezayên ji bilî yên bo vegerandinê bikevin ber lêpîrsînê.

Eger hûn hez bikin vegerandinê qebûl bikin, piştî hevpeyvîna ji aliyê Dozgerê venêrînê va, dozgerê venêrînê dê guh bide we. Dozgerê venêrînê dê pirsgirêkan şirove bike. Renge parêzerekî ji arîkariya we bike. Renge hûn tenê li ber dozgerê venêrînê vegerandinê qebûl bikin.

Dema ku we bi awayî hiqûqî vegerandin qebûl kir, êdî pêwîst nake li dû pirsê vegerandina xwe biçin

## Hûn çiqasî dikarin binçavkirî bimînin?

### 1. Di rastiyê da 48 saetan

Hûn divê ji 48 saetan zêdetir binçavkirî nemînin.

### 2. Dozgerê venêrînê

— Di nava 48 saetan da yan hûn ê azad bibin yan biçin li bal Dozgerê venêrînê. Ew ê biryar bide gelo li gorî hikmê girtina ewrûpî werin binçavkirin yan na.

— Dozgerê venêrînê divê berê li bara mijarê guh bide we. Heqê we ye parêzerê we hebe. Dozgerê venêrînê divê guh bide nêrînen we li bara binçavkirina ihtimalî yan yên ku parêzerê we dibêje.

Renge hûn dev ji mafê xwe yê wergirtina parêzer berdîn lê tenê eger emr û temenê we yê qanûnî be.

— Eger Dozgerê venêrînê hikmê girtina we bide, heqên we yên jêrê hene:

- Hûn dikarin bêyî astengî bi parêzerê xwe ra biaxivin.
- Di nava panzdeh rojan piştî girtina we da, hûn ê li hemberî Odeya Erkan amade bin û hûn dikarin li wir bo hikmê girtina ewrûpî û binçavkirina xwe itiraz bikin. Hûn dikarin hemberî Odeya Cezanameyê vê daxwazê bikin ku ku ew ê jî di nava panzdeh rojan da biryara xwe bide. Ev daxwaz divê heya bîst û çar saetan piştî biryara Odeya Erkan a hûn lê bûn amade be.
- Roja beriya civîna Odeya Erkan yan Odeya Cezanameyê, hûn dikarin li dosyeya xwe binêrin.
- Parêzerê we dikare rêya zêde ya naveroka vê rêbazê bi hûrgiliyên pirtir şirove bike.

- Eger hûn hemwelatiyê Beljîkê nînin, hûn dikarin rayedarên konsûla welatê xwe ji girtina we agahdar bikin.
- Eger hûn zimanê hikmê girtina ewrûpî yan zimanê ku lê hatiye wergerandin, fêma nakin, wergera nivîskî ya hikmê girtina ewrûpî dê bi zimanekî bidin we ku hûn fêma dikin yan jî wergera wê ya devkî yan wergera devkî ya xalên girîng ên tomarkirina civînê ku beriya hûn li hemberî Odeya Erkan û li dawiyê jî beriya ku biryara dawîn a pêwendîdar pêk were ye.

**Hûn dikarin vê şiroveya heqên xwe xwedî bikin.**